Rûpelên tewandî – 6 rûpel – ji bo dêûbavan

Rûpel 1

Şagirtiya li ber destê comMIT!mentê çi ji te re tîne?

- Belgenameyeke beşdarbûnê
- Di miracaeteke ji bo stajekê/şagirtiyekê/xwendina zanîngehê de angajmana şexsî bi vê yekê xuya dibe. Maneya angajmanê ev e: vekirîbûna li tiştan û amadebûna fêrbûnê. Ev jî di pêvajoyên miracaetên wiha de timî bi kêr tên.
- Waqifbûn û naskirina meydanên nû yên pîşeyî (Xebata civakî, perwerdekar)
- Merît û kafîtiya ji bo ku mirov karê miqatebûna li zarok û ciwanan a piştînîvrojê li dibistanan / li malên ciwanan bike
- Gihandina zanîn û rêbazên nû di karê pedagojîk de
- Teşwîqkirina behremendiyên şexsî bi xwe û ewlebûna xwe bi xwe
- Pevgirêdana bi toreke teamler (endamên tîmeke xebatê) re

Rûpel 2

Kerem kin, peywendiyê bi me re deynin:

comMIT!ment
Jungenarbeit Hamburg e.V.
Bramfelder Straße 102 B
22305 Hamburg
Telefon: 040 / 607 85 919
commitment@jungenarbeit.info
www.jungenarbeit.info/commitment

Jungenarbeit Hamburg e.V. (Komeleya Karê Ciwanen) hemîlê Freie Jugendhilfe (Alikariya Ciwanan a Serbest) ye û weke komeleyeke li xêra civakê hatiye qebûlkirin. Em endam in li Paritätischen Wohlfahrtsverband (Yekîtiya Refahê ya Wekhevîxwaz) û BAG Jungenarbeit e.V. (Koma Federal a Xebatê ya Karê Ciwanan).

Rûpel 3

comMIT!ment

angaje ye ji bo baldarî, pirrengî û rûmetê

Rûpel4

comMIT!ment dixwaze

- mirovan xurt bike, wan mirovên ku bûne mexdûrên cudakerî û lidervehiştinê û yan jî hîna mexdûrê wan in,
- tecrûbeyên şexsî teşwîq bike weke destpêka kirina xweser, li ser hatî fikirîn û bi xwe bawer tê kirin,
- wan rêyan nîşan bide ku diçin ber bi jiyaneke bi hev re ya hemû mirovan bi hevmafî, ji nijadperestî, cinsiyetparêzî û homofobiyê paqijkirî,
- behremendiya hiskirina kesên din û qabîliyeta xweîfadekirinê xurt bike,
- bike ku têrkeriya xwe bi xwe di jiyana rojane de karibe bête tecrûbekirin,
- derfetên mayînde ji bo danûstandin û kirina bêşidet xurt bike û
- muktesebatên civakî zêde û berfireh bike.

Rûpel 5

comMIT!ment çi ye?

Projeya comMIT!mentê ji bo ciwanan û mêrên ciwan e ku temenê wan di navbera 16 û 27 salan de ye. Em dixwazin wan heyranî wê yekê bikin ku jiyaneke bi hev re a di nava civakê de biparêzin, bi wî rengî ku hemû mirov xwediyê heman mafan bin. Em dixwazin mirovên ciwan li ser mijarên nijadperestiyê, dijminatiya jinan û homoseksuelan hestyar bikin. Em dixwazin destekê bidin wan di karûbarê wan ê ji bo baldarî, pirrengî û rûmetê de.
Proje bi du gavan bi rê ve diçe. Di gava pêşî de yên ku elaqeya wan heye beşdarî komxebateke sê yan jî pênc saetî dibin. Li vir ew derfet çêdibe ku ev kes projeyê û mijarên wê yên sereke nas bikin.
Di gava diduyan de mêrên ciwan dikarin şagirtiyeke teamler (endametiya tîmeke xebatê) bikin. Em bawer dikin ku mirovên ciwan ew kes in ku hawîrdora jiyana xwe herî baş nas dikin. Ji ber vê yekê em destekê didin wan ku ew bi xwe rêyan bibînin ji bo bihevrejiyana hemmafî. Bi şagirtiyê derfeta beşdaran çêdibe ku vê zanîn û tecrûbeyê bidin hevsal û hogirên xwe.

Rûpel 6

comMIT!ment van xizmetan pêşkêş dike:

- şagirtiyeke ji bo bûna teamler (endametiya tîmeke xebatê) (asayî em hefteyê carekê 2 saetan dicivin û bi temamî 25 civîn in),
- derfeta ku wekî teamler mirov zanîn û tecrûbeya xwe bide hemsal û hogirên xwe,
- miameleyeke bi naverokê û bi pratîkê ya bi nijadperestiyê, dijminatiya jinan û homoseksuelan re,
- minaqeşeyên li ser wê yekê ka mirov çawa ji bo pirrengiya civakî û hevmafiya hemû cinsan bixebite,
- derfeta tecrûbekirina şanoyê bi rêbazên pedagojîk,
- fêrbûna stratejiyên danûstandina bê şidet,
- şensê berhevkirina tecûbeya birêvebirina sinifên dibistanan yan jî koman û
- teatiyeke fikran bi mirovên peywendîdar re li ser mijar û babetên comMIT!mentê.